Şopdara Rastiyê ye
# Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1244 | 2-Sibat-2025 | www.ronahi.net/ku/

**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/ | rojnameyaronahi | @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com | Rojnameya Ronahî | +963 984 370 218

# Rêûresma Zêw û Bûka Baranê

**Jîn Hisên/Qamişlo**



**Di bîrdanka gelê kurd de gelek kevneşopên ku beriya hezarê salan maye, ji adetên kevin ku hatiye parastin adeteke civakî ye di werza çile de dema ku baran dereng dimîne jê re dibêjin(zêw) ya din jî(Bûka Baranê).**

Di tevahî civakên cîhanê de, rêûresmên cuda hene ji hin mijarên civakî, her civak bi rengên cuda van rêûresman pêk tînin, yek ji van rêûresman jî dema baran dereng bibare, an jî qet nebare, civaka kurdî ji demê berê heya niha vê rêûresmê pêk tîne. Ev kevneşopî di bîrdanka kurdan de rûniştiye, weke çanda “Zêw û Bûka Baranê”.

“Zêw” Bi kurdî jê re tê gotin, bi sedêsalan e gelê kurd vê çandê pêk tîne, kevneşopiyeke di çarçoveya werza çile de tê kirin, dema barîna baranê dereng dikeve, ji bo rêgirtina li pêşiya hişkesaliyê ev yek tê kirin. Li gorî çend lêkolîneran, rêûresma Zêw kevneşopî an rêûresmeke civakî ya kevnar a kurdî ye ku dîroka wê vedigere bi hezarê salan. Ev rêûresm di dîroka kevin de di riya pêşengehên salane bi dawîbûna werza havînê dihat kirin, ji bo amadekirina demsala baran û çandiniyê. Ji bo ku spasiya xwezayî îfade bikin, bi derbasbûna demê re êdî mirov derengmayîna barîna baranê ji ber derengmayîna mirovan di spasiya xwezayê de difikre, ji ber vê yekê berê xwe didan rêûresma Zêw her ku baran dereng dima.

**Awayên rêûresma Zêw**

Nimêj û dua: Mirov li cihekî diyarkirî wek mizgeft an cihên xwezayî kom dibin û ji Xwedê re dua û nimêj dikin ku baran bibarîne. Stran û dîlanên gelêrî: Di rêûresmên Zêw de stran û dîlanên gelêrî tê kirin ku daxwaza barîna baranê îfade dikin.

Di rêûresmên Zêw’ê de xwarinên kevneşopî tên çêkirin û bi hevre têne xwarin.

Rêûresma Zêw bi amadekirina şahiyekê tê lidarxistin ku hemû gundî an şîniyên taxê tê de beşdar dibin û tê de hemû niştecihên gund bi hev re xwarinê dixwin, bi berzkirina stranên girêdayî baranê jê wan jî strana “Bûka Baranê” û dua û nimêj têne kirin. Hin ji rêûresmên Zêw, ew e ku mirov cilên xwe bi hev diguherîne, an jî berovajî li xwe dikin, bi mebesta destnîşankirina xizaniya ku wê bi ser mirovan de bê dema ku baran nebare. Hin rêûresmên îslamî ketine di nava rêûresma Zêw’ê de, ku şênî nimêja Istisqa, ew ji du reketan pêk tê û bi îmam re nimêj dikin, daxwaza barîna baranê dikin. Weke ji her kesî re tê zanîn ku herêma Cizîrê, xwe dispêre ser çandiniya demsalê di jiyana xwe de, piraniya erd tên çandin û xwe dispêrin barana demsalî, yanî derengmayîna barîna baranê yan kêmbûna wê bi awayekî neynî bandorê li ser werzê çandiniyê dike.

**“Bûka Baranê”**

Bûka Baranê navê rêûresmeke çandî ye û di çand, kevneşopî û bîrdanka kurdan de rûniştiye ku her car ji aliyê zarok û civakê ve tê lîstin. Ew rêûresma çandî li hemû deverên kurdistanê jî tê meşandin, her sala ku baran nebare yan jî hişkesalî bi ser herêmekê de were. Dil û hêviyê cotkaran diçilmise, ji ber debara milet li ser zevî û çandiniyê ye, ji xwe heta roja îro jî wiha ye. Piraniya gelê kurd ji ber ku bi çandinî û axê re têkildar in, debar û dahata wan jî, ji vê ax û çandiniyê dihat.

Di heyamê berê de mezin diçûn talanan û zarokan jî ji xwe re bi rêya rêûresmeke ji aliyê zarokan ve Bûka Baranê çêdikirin û daxwaza barîna baranê dikirin. Ji ber tê gotin dua û daxwazên zarokan tê qebûlkirin û dibe sedem û badora ku baran bibare. Lê di ola islamê de ev daxwaz bi awayekî din tê kirin ku koma zilaman û ya jinan ji hev cuda dest bi nimêja daxwaza baranê dikin.

**Çawaniya rêûresma Bûka Baranê**

Destpêkê ji aliyê koma zarokan bûkek ji dar û paçikan çêdikin, bi stûneke dirêj ji jor ve hildidin û li kolan û gundewaran digerin û dest bi duayan dikin. Bi bangkirin û gazîkirinê re li deriyên malan didin, xwediyê malan jî tasek av tavêje ser wan an jî li pey wan direşîne. Ev rêûresmên mîna Zêw û Bûka Baranê beşek ji mîrata çandî û olî ya kurdî ye, lê di civak û çandên din ên cîhanê de jî kevneşopiyên bi vî rengî têne dîtin. Rêûresmên ku bi armanca hêvî û daxwaza barîna baranê di gelek çandan de têne kirin, nemaze di civakên ku debara xwe bi çandiniyê tînin û ew jî girêdayî barana baranê ye. Çend nimûne, rêûresm, hêvî û daxwazên ji bona barîna baranê di çandên cuda de.


Hindistan: Rêûresmên wekî “Yajna”, ew rêûresmek agire ji bo gazîkirina baran û bereketa çandiniyê tê kirin. Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê: Di hin eşîrên xwecih û resen yên Amerîkî de, dansên ku bi navê “reqsên baranê” têne nas kirin hene ku ji bo gazîkirina baranê têne kirin. Japonya: Rêûresmek kevnar heye ku bi navê “Ame-no-Torifune” tê nas kirin ku ji bo gazîkirina baranê tê kirin. Afrîka: Di hin civakên Afrîkî de, rêûresm bi vî rengî têne kirin ku ji bo baranê bi reqs, stran û duakirinê vedigirin.

Ev rêûresm mîrateya dewlemend û cihêreng ku hewcedariya mirovan a xwezayî ya ji çavkaniyên avê îfade dike nîşan dide, û çawa civakên cuda vê hewcedariyê bi awayên cuda diyar dikin.

# Bavê Teyar



**Can Yûsif**



**Qamişlo bo te xemgîne**
**Hêstrê xwînê dibarîne**
**Li ser te ew dinalîne**
**Girêdaye reş û şîne**

**Rojava ser te digirî**
**Şar û gundan reş wergirî**
**Welat tev ser, te pingirî**
**Ta gulbaxan çilmisîne.**

**Rojava, Bakûr û Başûr**
**Kurdên cîhan li çarmedor**
**Ta bilbil û gul û tilûr**
**Li ser te bûne xemgîne.**

**Ev çand sale bi hezaran**
**Zarok û Kal çar kinaran**
**Ted’ kenandin li her waran**
**Îro tev ser te digrîne.**

**Hunermendê jîr û çeleng**
**Newroz û sersal û aheng**
**Bi çûna te mane bê deng**
**Ken û şahî tev revîne.**

**Pirsa ted’ kin kurd çar kinar**

**Dibêjin ka bavê Teyar**
**Şanogerê sembola kar**
**Xweşya şano bê te nîne.**

**Şano, huner,çand û kultûr**
**Sema ,dîlan û filiklor**
**Pirsa ted’kin li hawîrdor**
**Dibên bê te me reng nîne.**

**Dika şano ser te digrî**
**Ken nema lê, reş werdigrî**
**Barê xeman ew hildigrî**
**Bi çûna te di qêrîne.**

**Ji wan waye ku tu kuştin**
**Tovê te çand wan ne hiştin**
**Ew nizanin bax jê miştin**
**Gulbaxên te bişkivîne.**

**Saxî tucar tu na mirî**
**Rewanpakî tu nemirî**
**Çira te qet venamirî**
**Şewq û ronî didê jîne.**

**Sudoku: Bersiv 25**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 5 | 8 | 9 | 6 | 1 | 2 | 4 | 7 |
| 7 | 6 | 9 | 4 | 5 | 2 | 3 | 1 | 8 |
| 2 | 4 | 1 | 3 | 8 | 7 | 5 | 6 | 9 |
| 5 | 2 | 3 | 6 | 7 | 4 | 9 | 8 | 1 |
| 1 | 7 | 4 | 2 | 9 | 8 | 6 | 3 | 5 |
| 8 | 9 | 6 | 1 | 3 | 5 | 7 | 2 | 4 |
| 9 | 8 | 2 | 5 | 4 | 6 | 1 | 7 | 3 |
| 6 | 3 | 7 | 8 | 1 | 9 | 4 | 5 | 2 |
| 4 | 1 | 5 | 7 | 2 | 3 | 8 | 9 | 6 |

**Sudoku:Pirs 26**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | 4 | | | | 8 | 7 | |
| | | 8 | 7 | | 5 | | | |
| | 5 | | | 4 | 6 | | | |
| 6 | | 5 | | | 4 | 2 | | |
| 4 | | | | 7 | | | | 8 |
| | | 9 | 2 | | | 3 | | 6 |
| | | | 1 | 9 | | | 8 | |
| | | | 4 | | 8 | 5 | | |
| | 8 | 2 | | | | 6 | | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**LI SER BIKÊRHATINÊ**

**Cila xwe ji avê dertîne:**
- Dikare bi serê xwe karê xwe bi rê ve bibe.

**Çavê kul derman kir:**
- Bi kêr hat.

**Didanên min lê diçin:**
- Ez pê dikarim; ez bi xwe re dibînim wî karî bikim; ez dikarim li hemberî wî têkoşînê bidim; ez dikarim ji heq derkevim.

**Didanên wan li hev diçin:**
- Bandora wan li ser hev heye; bi hev dikarin.

**Dinyaya xwe dixwe:**
- Bi kêrî karê xwe tê; bi her kesî re dixwe; ji karê siyasetê baş fêm dike; durûtiyê dike.

**Dikare kerê xwe ji heriyê derîne:**
- Xwebixwe dikare karê xwe bike; pêwîstiya wî bi kesekî din nîne.

**Ez dikarim kerê xwe pê ji bor derbas bikim:**
- Ez dikarim karê xwe pê bidim meşandin; ez êdî ne muhtacê ti kesî me.

**Hê agir jê diçe:**
- Hê li ser xwe ye; hê neketiye; hê dikare kar bike.


**Hê xêr tê de heye:**
- Hê li ser xwe ye; hê baş e; hê bi kêr tê.

**Kulavê xwe ji avê derxist:**
- Bi ser ket; pirsgirêk çareser kir.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Newroz Uysal: Abdullah Ocalan ji bo çareseriya pêvajoyê xwedî hêz e

Parlementera DEM Partî û parêzera berê ya Abdullah Ocalan Newroz Uysal diyar kir ku geşedanên li Rojhilata Navîn û Tirkiyê diqewimin, Abdullah Ocalan ji nêz ve dişopîne. Herwiha Newroz tekez kir ku Rêber Apo ji bo pêvajoyê xwedî hêza çareserkirinê ye.**R-4**




## ‘Azadî bi dest nayê girtin lê bi têkoşînê tê jiyankirin’

Endama Akademiya Jineolojî Aliya Osman diyar kir ku bê zanist û şoreş di nava civakê de guhertin çênabe, di heman demê de rastî ,wekhevî û azadî jî pêk nayê û got “Bidestxistina azadiya jin û civakê bi rêya rêxistinkirin, îrade, têkoşîn û welatparêziyê pêkan e.”**R-2**



Şopdara Rastiyê ye
# Ronahî
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1244 | 2-Sibat-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

## ‘Ez ê li ser hîmên Ragihandina Azad xebatê bidomînim’



Rojnamevan Silêman Ehmed diyar kir ku dema wî dixwest ji Rojavayê Kurdistanê derbasî Başûrê Kurdistanê bibe, ew bi komployekê ji aliyê PDK’ê ve hat revandin û wiha got: “Ez ê li ser hîmên Ragihandina Azad kar û xebatên xwe bidomînim.”**R-5**

## ‘Li bendava berxwedanê destanên dîrokî’




Rojnamevan Ela Hiso diyar kir ku îro li Bendava Tişrîn, gel û şervanên azadiyê destanên dîrokî dinivîsin, pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina av, ax û welatê xwe, bi fedayetiyek mezin li hemberî tang û topên dewleta Tirk a dagirker li ber xwe didin.**R-6**

# BI HEVGIRTINA GELAN WÊ DAGIRKERÎ TÊK BIÇE

Dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê ji 8’ê Berfanbara 2024’an ve dest bi êrişên li ser Bendava Tişrînê kir û heta vê kêliyê jî êriş bi dijwarî dewam dikin. Li hemberî van êrişên hovane, şervanên QSD û YPJ’ê berxwedaneke dîrokî nîşan didin û derbeyên giran li dagirkeran dixin. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî li hemberî êrişan seferber bûne û ji bo destekdayîna şervanan û parastina axa xwe li Bendava Tişrînê nobetê digrin. Herwiha bi berxwedan û hevgirtina gelan wê êrişên dagirkeriyê têk biçin.**R-3**



## Bi berhemên hunerî kêliyên berxwedana pîroz îfade dikin

Bi hemdemiya girîngiya pêvajoyê re gel, sazî, destgeh û tevgerên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li rex QSD’ê di heman eniyê de şer dikin. Hevserokê TEV-Çand a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Xelîl Tehlo anî ziman ku bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî mîrasa şoreşa Rojava tê parastin û bi vê helwestê 8 berhem ji bo piştgiriya hêza QSD’ê hatin derketin.**R-7**





**Kurd aştiyê dixwazin**
Mihemed Seydî R-4


**Ne itîfaq û lihevkirin be, aqûbeta Esed e**
Idrîs Henan R-5


**Kurdê misliman û paşeroj**
Hafiz Ahmet Turhalli R-6

# 'Azadî bi dest nayê girtin lê bi têkoşînê tê jiyankirin'

Endama Akademiya Jineolojî Aliya Osman diyar kir ku bê zanist û şoreş di nava civakê de guhertin çênabe, di heman demê de rastî ,wekhevî û azadî jî pêk nayê û got "Bidestxistina azadiya jin û civakê bi rêya rêxistinkirin, îrade, têkoşîn û welatparêziyê pêkan e."

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê pîvanên azadiya civak, jin û ferd de, endama Akademiya Jineolojî Aliya Osman bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Azadî di cewherê xwe de çawa tê jiyankirin û kengî pêktê?**

Azadî çiye ew pirsek her tim di civakê de tê kirin. Dema peyva azadî tê gotin tirsek çêdibe, bi taybet dema em dibêjin azadiya jin, ji ber ku her tim azadî di nava civakê de tê şîrovekirin û tê gotin ku mêr azad e, çima azade? Ji ber ku ew çi dixwaze dikare bike, kes nikare mudaxeleya wî bike, lê azadî çawa bê exlaq, nirx û zanist tê pênase kirin, ev jî pênaseya herî şaş ji azadiyê re tê kirin. Dema em dibêjin pîvanên azadiyê ji bo mêr û jinê çi ye? Kesayetên azad û civakên azad heman tişte. Mirovên azad ne tenê ji bo xwe dihizirin çi bikin, di pîvanên wan de ezeztî tunebe, lê têde wekhevî hebe, mirov li ser nirxekî mezin bike. Di heman demê de armancên mirovan ne tenê li ser bingehê zêdebûn, hebûn û parastin be, lê li ser bingehê ji jiyanê ji min re çi pêwîste.

Mînaka wê her tim em dibêjin Rêberê me Rêber Apo kesayetekî azade, ji ber ku hizir û ramanê wî azad e, ev pîvan çiqas em di civaka xwe de dibînin, mirov tenê ji bo berjewendiyên xwe bi ezeztiya xwe jiyan nake, lê ji bo mirovên li hemberî xwe jiyan bike, kesayetek xwe li jorî mirovên hundir nebîne,



her kes bi sîstemên wekhevî jiyan bike. Jiyanek bê netewperestî, olperest be, ev hemû pîvanên azadiyê ji wata wê derxîne. Dema ku civak van nirxan ji nav xwe derxîne bi xwe civak û kesayetên azad ava dike.

**Gelo civakên azad çawa pêk tên û pîvanên civakên azad çi ne?**

Yek ji pîvanên civakên azad ew e ku demokratîk be û her kes di nava civakê de xwedî nêrînbe. Lê dema ku di sîstemên demokratîk de, civak du rengî yan sê rengî têde hebe, herwiha rengek ji wan an pêkhateyek ji wan pêkateyan, hejmara xwe zêde bin, ew dihêle ku hejmara zêde nêrîna xwe li ser kesayetên din feriz bikin, mîna li gorî demokratîkbûnê biryarek hate derxistin û li gorî wan hate dayîn, ev yek bandoreke neyînî li ser pêkhateyên din ên civakê dike. Civakeke azad tenê bi parastina hebûnê ne pêkane, lê pêwîste hevsengî di nava pêhateyên di civakê de hebe. Di heman demê de dema em dibêjin civakbûn, civakbûna yekemîn jî li derdor jinê ava dibe. Mirov bê civakbûnê winda dibe, ji ber dema ku takekes di civakê de pêş dikeve, dibe sedem ku civak tar û mar bibe.

Girînge ku hevsengî di navbera civakeke azad û kesayeteke azad bê çêkirin, ji bo em karibin wê hevsengiyê ava bikin em dibêjin pêwîste ku civakeke exlaqî û polîtîk were avakirin, lê di pîvanên civakê û rêbazên hebûnên heyî de, çiqas karibe wê di nav xwe de bihewîne, bi taybet civakên heyî ji milê jinê ve, her siyaset hatiye meşandin ku hebûn û xwebûna wê winda bike, bê îrade bike û cihê wê di nava civakê de nehêle. Herwiha di dîrokê de jî, em binêrin bi hemû rêbazan şikestina jinê dikin armanc, mîna ol û hemû hişmendiyên serdestê civakê, her wekî din jî di zanist û felsefeya ku li ser vî bingehê hatine avakirin. Hebûna jin bi jin heyî, ne tenê em bêjin civaka Rojhilata Navîn, her deverek li gorî civaka wê modêleke jinê hatiye avakirin, van modêlan jî hiştiye jin hebûna xwe windabike.

**Jin kengî ji bin desthilatdariyê derdikeve û çawa dikare xwe azad bike?**

Dema em bêjin azadî, jin azadiya xwe bixwaze destpêkê incax hebûn û zanebûna xwe ava bike, rastiya xwe nas bike. Jin dikare çi bike, çawa bihizire û jin heta kîjan astê hêza xwe heye? Her tim jin ketiye bin zextê, ev yek hiştiye bê hêz, hizir û hebûna xwe jiyan bike, wê demê em nikarin bêjin civak azad e. Da ku em civakê azad bikin û zanebûnên wê bilind bikin, pêwîste jin azad be.

Her tim em dibêjin jin di serdema noletîkê de azad bû, pirs tê kirin çima jin wê demê azad bû, çi çudahî di navbera wê demê û vê demê de heye? Em bihizirin di wê demê de li gorî lêkolînên heyî, jin koletî jiyan nedikir, li ser jinê pîvan û qalibin eşîrtî yan olî nedihatin kirin. Jin zanist diafirand, zanista wê di civakê de hebû, him zanista wê ayidê wê bû, bi navê kesekî din pênase nedibû, ji bo wê em dibêjin serdema nolotîkê serdema ku jin têde azadî jiyan dikir.

Di roja îro de berûvajî wê jiyana jinê ne ya wê ye, tenê ji bo xwe jiyan nake, ji bo malbat, eşîre, nirxên zarokên xwe jiyan dike, di dawiyê de jî sîstemê qirkirinê sîstematîk li ser hebûnê wê tê kirin. Ev jî bandora kevneşopî, ol, dewlet û şerên ku her tim diqewimin. Dema ku şer rû dida, jin dihat tunekirin, vê yekê bandor li ser rewşa jinê kir û hişt ku jin azadî wek xeyal nas bike.

Lê niha ji bo jin azad bibin çi pêwîste, yekemîn nirxên jinên Rizgariya Kurdistanê em dibînin, têkoşîn, welatparêzî, estetîk, îrade û rêxistinbûyîne, bi van nirxan jin dikare xwe azad bike. Mîna ku welatparêzî û welat çiye, nirxên têkoşînê asta têkoşînê çawa be, jin çawa baş gavên xwe her tim pêş de bavêje, ji bo hebûna xwe têkoşîn bike, têkoşîn jî bê rêxistin nabe. Heger em vedigerin sîstemên dewletê, her tim ferd tê bingeh girtin, jin di hemû warên jiyanê de, bê bandor hatiye hiştin. Armanc ji avakirina rêxistinên jinan ji bona têkoşîn û parastina mafê jinan û hilweşandina hişmendiya desthilat ya ku li ser jinê tê meşandin. Bi riya rêxistin, îrade, têkşîn, zanebûnê û berxwedanê em dikarin azadiya jin û civakê pêkbînin.

**Gelo civakên bê şoreş dikarin xwe azad bikin û çima şoreş ji bo azadiyê girînge?**

Bê zanist û şoreş di nava civakê de guhertin nabe, rastî wekhevî û azadiyê jî nayê pêkanîn. Lewra em dibêjin civaka azad civakek exlaqî û polîtîke, ev jî pîvan pêwîstin, pîvanên vê civakê çiqas bi rêk û pêkin, çiqas civakê di milê polîtîk û axaqî ve xwe pêşxistiye? Nêrînên hemû civakê di nav xwe de dihewîne û bi van nêrînan girêdan û rêxistinek di nava xwe de avakirî ye? Dema di civakê de pir nêrîn çêdibe û polîtîkeyên wê tunebe, wê demê dibe ku gengeşe derkeve, heger em vê bi rojên me yên îro ve girê bidin, em dibînin her tim dewlet dixwazin civak bê polîtîk bihêlin da ku bê vîn û rêveberî be û li gorî xwe vê civakê bi rêve bibe. Sîstemên desthilatdar nahêlin civak sîstemên xwe bi xwe ava bike, ev jî dibe sedem ku civak ji hemû milî ve bê parstin mîne, wê demê ne azadiya civakê dimîne û ne jî azadiyê kesayetê dimîne. Di dîrokê de her tim civakbûn hebû, lê dewlet tunebû, civakbûn bi sîstemên eşîran û di nava gundan de xwe birêxistin dikir, ji bo wê jî civakbûyîn heta roja îro di Rojhilata Navîn de berdewa me. Têkoşîna me wek rêxistin wek jin ji bon ku em karibin civakê biparêzin û azadiya wê civakê pêkbînin pêwîste di serî de hemû kar û xebat ji bona avakirina civakeke polotîk û axlaqî were kirin.

# 'Çandên heyî di herêmê de tabloyeke balkêş dide'

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Rêveberiya Xweseriya Demokratîk ji cîhanê tevahî re bûye ninmûne. Rengîniya çandên heyî di herêmê de wêneyeke balkêş û xweşik dide diyar kirin.**

Di herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi destpêkirina aloziya Sûriyê ve, Rêveberiya Xweseriya Demokratîk li ser bingehê biratiya gelan û jiyana hevbeş hate avakirin, ev sîstem ji bo tevahiya cîhanê re bû nimûne. Bi rûxandina rêjîma Baas ev tecrûbe dikare bibe nimûneyek ji bo giştî Sûriyê, ku di destûra nû de hemû pêkhate, ol û bawerî cihê xwe tê de bigrin, nemaze jinên Sûriyeyî, bêyî dûrxistin an paşguhkirina tu aliyekî.



Derbarê serkeftina tecrûbeya Rêveberiya Xweser û pejirandina wê ji bo giştî Sûriyê, Hevseroka Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Evîn Siwêd ji rojnameya me re axivî.

Evîn Siwêd di destpêka axaftina xwe de bal kişand ser hukmê rêjîma Baas ku çawa bi yekrengî dihat meşandin û di encamê de gel gelek êş û azar kişandin û wiha anî ziman:"Di heman demê de rola pêkhateyan dihat dûrxistin û di nava mekenîzmeya rêvebirinê de kes nebû ji bilî yek kesî. Desthilatdariyek ku tu carî li gel guhdar nedikir, tenê ji bo berjewendiyên xwe kar dikir, hem jî tu kesî xwe xwedî nedidît ku kar bikin ji bo Sûriyê."

**'Sistema Rêveberiya Xweser navê Sûriyê gihand cîhanê'**

Evîn Siwêd wiha berdewamî da axaftina xwe û got:"Piştî şoreşa Sûriyê, li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk hate raghandin û xwe birêxistin kir û bû cihê baweriyê di nava civakê de. Li hemberî terora DAIŞ`ê bi ser ket û cîhan tevahî ji xeteriyê parast.

Evîn Siwêd diyar kir ku dema mirov behsa demokrasiyê bike, helbet ew e ku her kes karibe di cihê biryarê de nêrînên xwe bîne ziman, bêyî cudahî, paşguhkirin û dûrxistin. Nimûneya Rêveberiya Xweser li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li tax, bajar û bajarokan tê pêkanîn, dihêle ku bibe nimûneya herî guncaw ji bo pêşeroja Sûriya nû.

**'Rêveberiya Xweser hemû pêkhateyên Sûriyê hembêz dike'**

Evîn Siwêd got:"Rêveberiya Xweser tevahî gelê Sûriyê hembêz dike û têde hemû pêkhate, beşên civakê, ol û bawerî bi hev re jiyan bikin û cihê xwe têde dibînin. Ji ber vê yekê pêwîste di rêveberiya nû de her kes cihê xwe bigre û di çarçoveya netewa demukratîk de cihê xwe di pêşeroja Sûriyê de bigre.

**Sûriyê wê ji bona hemû gelê Sûriyê be**

Evîn Siwêd destnîşan kir ku tecrûbeya Rêveberiya Xweser bi salaye ku heye û piştî aloziya Sûriyê hatiye avakirin û ezmûneke serkeftiye ji bona tevahî Sûriyê. Evîn Siwêd wiha gotinên xwe qedand:"Şêweyê Rêveberiya Xweseriya Demokratîk îro bûye ninmûne ji cîhanê tevahî re û her kes pesnê wê dide, ew maf û çandên heyî diparêze û bi tabloyeke herî balkêş û xweşk dide diyar kirin."



# Bi berhemên hunerî kêliyên berxwedana pîroz îfade dikin

Bi hemdemiya girîngiya pêvajoyê re gel, sazî, destgeh û tevgerên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li rex QSD'ê di heman eniyê de şer dikin. Hevserokê TEV-Çand a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Xelîl Tehlo anî ziman ku bi rihê Şerê Gelê Şoreşgerî mîrasa şoreşa Rojava tê parastin û bi vê helwestê 8 berhem  ji bo piştgiriya hêza QSD'ê hatin derketin.

**Esma Mistefa/ Qamişlo**

Pergala desthilatdar ji bo tunekirina hebûna civakan, hemû hêz û polîtîkeyên asîmîlasyonê bi kar tîne. Ev yek ji dîrokê hatiye kişandin û heyan niha jî li ser civakên bindest têne meşandin. Bê guman ji bo gelê Kurd jî ev yek derbasdar e, dijminên gelê Kurd bi hezar salan xwestine dest bavêjin çanda gelê Kurd û bi siyasetên gelek qirêj ji pêkanînên bi hezaran ji komkûjiyan hebûn, netew û çanda vî gelî kirine hedef. Lê mayîndebûna gelê Kurd ya heyî nîşaneya valaderxistina hemû pilanên hovane yên dijî gelê Kurd e. Gelê Kurd bi hêz, bawerî û sekna xwe ya berxwedêr niha destanên dîrokî ji cîhanê re dinivîsin. Bi taybet di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de yê ku her bûye armanca dagirkeran, hemû pilanên dagirkeriyê hatine têk birin û ev berxwedanî di nava hemû beşên civkê de tê teysandin. Li Bendava Tişrînê Bendava Berxwedanê kêliyên efsanewî têne xêzkirin, ev berxwedanî bi serê xwe bûye armanca dagirkeriyê, ji lewra hemû hêza xwe xistine meryetê de. Li kêlek berxwedaniya gel û hêzên leşkerî, xebatên gelek mezin têne meşandin, yek ji wan jî xebatên hûnerî yên ku ji aliyê TEV-Çanda Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve derketine pêş. Di vê pêvajoyê de bi gelek berhemên hunerî yên ku piştgiriya berxwedana gel û QSD'ê dikin derketin pêş. Têkildarî erk û berhemên ku di vê pêvajoyê de derketine, Hevserokê TEV-Çanda Bakur û Rojhilatê Sûriyê Xelîl Tehlo ji rojnameya me re axivî.

**Pêşdîtinên Tevgera Azadiyê dikevin piratîkê**

Xelîl di derbarê pêvajoya heyî de hin nirxandinên xwe anîn ziman û wiha got: "Şoreşa ku hatiye destpêkirin di 2011'an de bi nerêxistibûn û ne diyarkirina armancên xwe veguherî şoreşa çek, tundî û ji cewherê xwe derket. Lê belê tevgera me bi rêxistinbûna xwe û pêşdîtinên xwe, xeta xwe ya sêyemîn ku ne girêdayî Rêjîm û ne opozisyonê hilbijart. Tevgera Azadiyê ji destpêka vê pêvajoyê de di pêşdîtinên xwe diyarkiribû ku wê di sala 2025'an de guhartinên cidî bêne kirin. Li ser van bingehan şoreşa Rojavayê Kurdistanê gihîşt armancên xwe û bû mînak ji hemû tevger û şoreşên cîhanê re. Ji ber vê jî me dît di dawiya sala 2024'an de dewletên gilobal û hêzên cîhanî xwestin teşeyekî nû ji Rojhilata Navîn re xêz bikin û dest bi geşedanên Xezayê û Îsrayîlê her wiha ber bi hilweşandina Rêjîma Esed ve berdewam kir. Hemû hêsên alîgir yên Esed xwe paş ve kişandin û pilaneke nû hate amedekirin.

Tevgera Azadiyê jî bi rêxistinbûna xwe herwiha bi îlankirina Rêveberiya Xweser di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de sazî û destgehên xwe vekirin, gelek destkeftî bi dest xistin û li ser bingeha Netewa Demokratîk hebûna hemû netewan parast".

**Pêşketina xebatên çandê bi şoreşê re**

Xelîl bal kişand ser girîngiya destkeftiyên ku hatine avakirin, herwiha xebatên ku ji aliyê tevgera çand û hunerê ve hatine avakirin û wiha got: "Bê guman ev şoreş xwedî ked û xebateke giran e. Bi bedelên giranbuha saziyên civakî, tevger, partî û hêzên leşkerî hatin avakirin. Bi avabûna tevger û destgehên Rêveberiya Xweser re jî, beşa çand û hunerê jî xwe bi rêxistin kir û li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê xebat meşandin. Xebatên ku me bi pêş xistine mûzîk, govend, şano, Sîname, kurtefîlm, belgefîlm û herwiha di dawiya sala 2024'an de Peymangeha Bilind ya Mûzîkê bi tevlîbûna nêzî 80'î xwendekarî li ser asta Rojava hate vekirin. Herwiha ji aliyê xebata Xweser ve Paymangehek Bilind a Xweser li bajarê Hesekê jî hate vekirin. Xebatên me tenê di asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê de sînordar neme, li Heleb, Şam û hemû herêmên ku rengê Rêveberiya Xweser heye, rengê Tevgera Çandê jî lê heye. Em dibînin ku di vê dema heyî de Bakur û Rojhilatê Sûriyê di hemû aliyan de xwe bi rêxistin kir û bi hebûna pirrengiya hemû netewan re yekîtiyeke xwe avakir".

**Li bendava Berxwedanê mîrasê şoreşê tê parastin**

Xelîl girîngiya berxwedana ku tê raberkirin anî ziman û wiha pê de çû: "Bi guhartinên herî dawî yên ku li ser asta Sûriyê hatine çêkirin, ev zêdeyî 40 rojî ye dagirkeriya Tirkiy rêişî Bendava Tişrînê dike û rojane kumkujiyan pêktîne. Li




ser vê bendavê bi rihê şerê gelê şoreşgerî berxwedaniyeke pîroz tê meşandin, rojane îradeya gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina destkeftî û şoreşa Rojavayê Kurdistanê îsbat dibe. Gel li kêlek şervanên xwe li meydana şer li hember hemû topbaran û çekên dijmin li ber xwe didin. Ev berxwedanî bi taybet çavên dijmin li hember herêm û sîstema Rêveberiya Xweser şikandiye. Li ser van bingehan di vê pêvajoyê de em jî weke Deste û Tevgera Çand û Huner cihê xwe di vê berxwedaniyê de digrin. Bi taybet yek ji mîrasên Şanoya Kurdî Rêheval Cuma yê her tim bi Bavê Teyar dihate naskirin di vê berxwedanê de li ser Bendava Şehîdan di encama êrişên dagirkeriyê de Şehîd bû. Em bi rêzadrî bi bîr tînin û bejna xwe li hember hemû Şehîdan ditewînin".

**8 Kilîp û 14 Spot hatin weşandin**

Xelîl di derbarê berhem û xebatên ku hatine amedekirin û weşandin de got: "Bê guman di vê pêvajoyê de zêdetir bar li ser kar û xebata çandê giranbûye, çawa ku em bikaribin berxwedana ku tê raberkirin, îradeya gelê ku ref bi ref berê xwe dide eniyên şer herwiha rihê ku tê avakirin derxînin pêş, di serî de ev yek ji me tê xwestin. Ji lewra gelek kilîp hatin amedekirin. Bi taybet strana ku li ser QSD'ê hatiye amedekirin ew dengvedanek di giştî Kurdistanê de avakir. Heya niha 8 kilîp hatin amedekirin, navên wan berheman jî ev in (Em QSD'ê ne/ Mihemed Cûdî, Cenga Gelan/ Koma Cûdî, Guje Çemê Me/ hunergeha welat, Kilîpa Potîkan/ Varon Candemîr, QSD'ê Hêviya me ye/ Koma Şehîd Xebat- Keder Hisên, Kilîpeke biçûk ji navenda Kobanê ji bo QSD'ê, Welato/ Koma Agirî, QSD Heqîqete/ Danîş Botan). Her wiha 14 Spot bi gelek zimanan li ser piştgiriya QSD ê, YPJ ê û şervanan hatin amedekirin".

**Banga piştgiriya pêvajoyê tê kirin**

Xelîl di dawiya axaftina xwe de xebatên wan yên demên pêş anî ziman û wiha qedand: "Bi hemdemiya rojev û guhartinan re hin xebatên me yên demên pêş wê derkevin hene. Em amedekariya 4 kilîpan dikin, yek ji wan li ser Efrînê ye, her wiha yek jî li ser Qamişlo ye û di hazirtiyê de ye û yek jî li Reqa tê amedekirin. Bê guman li kêlek wê xebatên me yên rêxistinî jî têne meşandin. Zêdetir di vê pêvajoyê de bi riya xebatên hunerî em banga tavahî hunermendan dikin ku bi yek dengî piştgiriya vê pêvajoyê bikin. Ji ber wê jî pirojeyên me yên berfireh hene, herwiha festîvalên me yên salane hene, lê ji ber rewşa awerte ya heyî me rawestandine".

# Ehmê: Her kes xwedî name ye lê ne her kes jî xwedî lê derdikeve

**Hêvî Keleş/Qamişlo**

**Helbestvan û nivîskar Ebdulbarî Ehmê diyar kir ku diviyabe ku her kes xwedî name be û xwedî lê derkeve û wiha got:"Bi riya nivîsandinê re, ez hest û fikrên xwe destnîşan dikim".**



Ebdulbarî Ehmê di sala 1958`an de li bajarê Qamişlo ji dayîk bûye, refên amadeyî li Qamişlo xwendiye. Li Şamê jî enstîtuya Sporê qedandiye. Zêdetirî 34 salan jî li Qamişlo mamstetiyê dike. Îroj jî bi gelek karan re mijûl dibe û di heman demê de endamê HRRK`ê ye. Di derbarê jiyan, kar û xebatên xwe de Ebdulbarî Ehmê ji Rojnameya me re axivî.

**Astengiyên derbas kirine?**

Ebdulbarî Ehmê da zanîn ku ji 15 saliy xwe de dest bi nivîsandina çîrok û nameyan kiriye ev hişt ku di gelek astengiyan re derbas bibe û wiha got: "Di temenekî biçûk de min dest bi nivîsandina helbebest û hin çîrokan kir, lê ew ne gelekî xurt bûn. Li gor temenê min bala hin kesan dikşandin. Bi demê re û her ku temenê te mezintir dibe, bêhtir tu karim fikrên xwe zelal bikim û bi awayekî xweş bînim ziman. Halê hazir ez xweşik dinivîsim. Ne tenê helbestê dinivîsim, lê belê xwedî nameyeke hizirîn û siyasî me, di vî warî de gelek lêkolînên. Derfeta me nîn bû bi zimanê Kurdî binivîsin, lew re jî hemû helbestên min bi zimanê Erebî ne. Lê ji ber ku ne zimanê min ê dayîkê ye, ez hineke zehmetiyên rêziman dikêşim. Ji bo derbaskirina wê astengiyê jî hinek hevalên min hene destek didin min".

**Naveroka helbestan**

Ehmê anî ziman ku tiştên ew pê mijûl bûye di dîwanên xwe de çend tiştên sereke ne û wiha domand: "Min xwestiye ku di naveroka helbestên xwe de girîngiyê bidim çend tiştên ku ez wan sereke dibînim weke erd, jin, welat, jiyan û hezkirin. Dema hinek dibêjin hezkirin ne hezkirina jinê tenê ye, lê hezkirina her tiştî ye. Hezkirina jiyanê bi taybet ez ji jiyanê hez dikim. Jiyan çawa be, tevî hemû astengiyên wê ez jê hez dikim. Her ku yek mezin dibe xwendin zêde dibe, di helbestên xwe de sembol û hewa gelekî bi kar tînim. Di helbestê min de sembol û hewa, efsane û dîrok girîng in.

**Projeyên pêşerojê**

Nivîskar û helbestvan Ebdulbarî Ehmê diyar kir ku ji bo pêşerojê ew li ser pirtûkekê pir zehmet dixebite û ev tişt got: "Ev zêdetirî 2 salan e li ser pirtûkekê kar dikim bi navê "Trendên di ramana siyasî de û kirîza hişmendiya netewî ya kurdî" diviya bû ku tu hinekî dirêj bike ji ber ku ne tiştekî wêjeyî ye ku tu bi hêsanî lê binere fikir, siyaset, dîrok, şoreş û gelek tiştin din. Ez her roj lê vedgerim û li ser kar dikim di dawiya salê de hêvî dikim ku bi dawî bikim, ev pirtûk wê pir li ba min bi qedir be li gor vê pirtûkê wê civak zanibe bê ez çiqasî dikarim binvisim ji ber ku dîrok pir zehmet e ku tu xweşik negirî dest tê yê xwe biêşînî. Her wiha daxwazin min hene ku ev tiştên dinivisim ji bilî wêjeyê yên fikir û siyasî jî bighînim sazî û navendan".

**Hin berhemên Ebdulbarî Ehmê ev in:**

- Murala sirgûnê di dema şîrovekirinê de.
- Kiş melêk.
-Dawet ji bo kavirên por yê Jîna.
-Mmo melakê deman….

# Li bendava berxwedanê destanên dîrokî

Rojnamevan Ela Hiso diyar kir ku îro li Bendava Tişrîn, gel û şervanên azadiyê destanên dîrokî dinivîsin, pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji bo parastina av, ax û welatê xwe, bi fedayetiyek mezin li hemberî tang û topên dewleta Tirk a dagirker li ber xwe didin.

**Amara Baran/ Qamişlo**

Rojnamevan Ela Hiso ku kêliyên dîrokî yên li bendava berxwedanê ji nêz de şopandiye û kêlî bi kêlî berxwedana gel û şervanan ji raya giştî re ragihandiye . Ela Hiso li ser mijarê ji rojnameya me re axivî.

**‘Gel Bi Rihê 19’ê Tîrmehê Li Bendava Tişrînê Li Ber Xwe Dide’**

Ela Hiso diyar kir ku di 8’ê Kanûna 2024’an de piştî ku rewş li Sûriyê guherî, dewleta Tirk û çeteyên wî êrişên xwe li ser bendava Tişrîn û Qereqozaq û gundewarên Minbicê bi awayek dijwar domandin. Hiso wiha dewam kir :”dewleta Tirk a dagirker bi hemû teknîka xwe êrişî bendavê dike ku dagir bike, berxwedana gel û şervanan teknîka wê vala derxistiye û nekariye gav pêş de biavêje. Gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê di çarçoveya şerê gel ê şoreşgerî de çawa ku Şoreşa 19 Tîrmehê dest pê kir îro jî heman ruh li bendava Tişrînê tê meşandin, kêliyên ku li bendavê tên meşandin mirov nikare tene wek kêliyên berxwedanê bigre dest ji ber ku destanên dîrokî tên nivîsandin, dê dîrok bi tîpên zêrîn wan destanan binivîse. Çawa ku neynûk û goşt ji hev cuda nabin, şervan û gel jî bi hev re wê berxwedanê dewam bikin. Dewleta Tirk a dagirker zêdetirî 49 rojan hewil dide bi komkujiyan li bendavê dagirkeriya xwe ferz bike”.

**Êrişên Dewleta Tirk Li Pêşiya Berxwedana Gel Nabin Kelem**

Ela Hiso got ku edî dem ne dema berê ye ku dewleta Tirk û çeteyên wê bi hêsanî derbasî heremên me bibin û dagir bikin û ev axaftin li gotinên xwe zêde kir: “Îroj berxwedan û şerê ku tê meşandin şerê hebûn û tunebunê ye, di raya giştî de jî bi awayekî zelal derdikeve holê ku çawa gel li hemberî teknîka herî pêşketî, balefirên şer û yên bê mirov dîlanên azadiyê digerîne. Tevî ku derdora bendavê bi awayek dijwar tê topbarankirin jî, lê nikare gel asteng bike. Bendava berxwedanê bi bedewî, fedekarî, wêrekî, hêrs û biryardarî tê parastin, gel û şervan bi israrek mezin dibêjin ku em nahêlên bendava berxwedanê bikeve, edî ew bendav bûye bendava rûmetê. Îroj



gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe rûmeta xwe diparêzin. Çendîn bedelên giran hatibin dayîn jî, lê tilîliya dayîkan bilindtir dibe û govenda berxwedanê li dar e”

**‘Yan Jiyanek Bi Rûmet An Jî Mirinek Bi Rûmet Be’**

Ela diyar kir ku berxwedana li bendavê pîroz e. Li bendavê bi slogana Berxwedan Jiyan e têkoşîna serkeftinê mezin û firehtir dibe, û got: “Li bendava Tişrînê xwîna gelên Bakur û Rojhilatî Sûriyê bi hev re diherike. Pêkhateyên ku îro li seranserê rojava berê xwe didin bendavê tekez dikin ku “Yan jiyanek bi rûmet an jî mirinek bi rûmet be”. Dema berê xwe didin Tişrînê her tiştî didin ber çavên xwe. Dagirkeriya Tirk jî bi awayekî dermirovî dîlanên gel bomberdoman dike. Lê çiqas şehîdat çêdibin jî, kîn, nefret û berxwedana gel jî mezintir dibe. Berxwedana ku 19 rojin didome 22 berxwederên ji hemû pêkhateyan gihaştin asta şehadetê, zêdetirî 200 kes jî birîndar bûne, gel bi xwe jî digot; şehadet û birîndarî li pêşiya me nabe kelem edî dem ne dema tirsê ye heta dawiyê em ê parastina av, ax û enerjiya xwe bikin”.

**‘Berxwedana Li Bendava Tişrîn Li Ti Deverên Cîhanê Nehatiye Dîtin’**

Ela tekez dike ku gelên Bakûr û Rojhilatê Sûriyê xwedî vîn û baweriyeke xort in ku li hemberê komkujiyan li ber xwe didin û wiha dewam kir: “Ked û berxwedana ku îro gel li bendavê dike di ti şoreşên cîhanê de nehatiye dîtin. Tevî ku bi çekên giran û balefirên şer kerwanên gel tên bombebarankirin, bi fedayetiyeke bêhempa şehîd û birîndar tên rakirin. Gel bi israr û îradeyek xort berê xwe dide bendavê û bi israr dibêje; em ê bi têkoşîn û vîna xwe dewleta Tirk têk bibin. Dewleta Tirk ji helwesta gel ditirse ku îro êrişên xwe dijwartir dike, vîn û baweriya ku gel ji fikir û felsefeya Rêber APO û şehîdên xwe girtiye wê bibe tirs û xofek di dile dewleta Tirk de. Dagirkeriya Tirk dîlana azadiyê hezim nake, lew re jî hedef digire. Hemû rêyên ku diçin bandavê topbaran dike, lê nekariye meşa gel a ber bi bendavê ve jî asteng bike”.

**Dewleta Tirk hemû ferdên civakê hedef digre**

Ela diyar kir ku dewleta Tirk ne tenê şervanan, hemû beşên civakê, rojnamevan, nivîskar, hunermend û siyasetmedaran hedef digire û ev tişt anî ziman: “Herî dawî şanogerê Kurd, di encama êrişên li ser bendavê de şehîd bû. Bavê Teyar bi berxwedan û sloganên ku diavêtin wek ku diçû hecê, Bavê Teyar her tim digot bendava berxwedanê ji bo me heca azadiyê ye ku em li kêleka şervanên xwe bisekinin. Bi helwesta xwe ya welatparêziyê jiyana xwe ji bo gelê xwe feda kir. Helwesta Bavê Teyar ji bo me rûmet e. Xwesteka Bavê Teyar ew bû ku şanoyek li dar bixe êş û azarên gelê xwe bi şanoya xwe ji gel re pêşkeş bike. Lê dewleta Tirk a faşîst bi awayek dijwar herem bombebaran kir ku di encamê de Bavê Teyar şehîd bû.

**Dewleta Tirk Ekîpên Heyva Sor A Kurd Jî Dike Hedef**

Dewleta Tirk sûcên dermirovî li bendavê pêk tîne û ambûlansên ku dixwazin birîndaran veguhezînin nexweşxaneyên Kobanê û Tepqayê hedef digire. Ekîpên Heyva Sor a Kurd, tevî dijwariya topbaran û bombebaranê, bi ruhekî fedayî erkên xwe pêk tînin. Li rex ambûlansan, bi dehan otombêlên gelê jî hatine bombebarankirin”.

**‘Parastina mafê mirovan çavê xwe ji komkujiyan re digre’**

Ela anî ziman ku: “Gelê Kurd moralên xwe ji gotina hebûn û tunebûnê digre, bi dehan salin axa Rojava bi xwîna zarokên xwe av dide û xwedî soza şopandina rêya şehîdan e. Komkujiyên ku îro li ber çavên cîhanê li ser gelê heremê tên meşandin, hêzên navnetewî û kesên ku dibêjin em parastina mafên mirovan dikin, li hemberê komkujiyên li ser sivîlan ti bertek nîşan nedane û bêdeng in”.

**‘Em ê bibin dengê gel’**

Ela bal kişand ser hedefgirtina Rojnamevanan û got: “Dewleta Tirk beriya ku dest bi êrişên xwe yên qirkirinê bike destpêkê rojnamevanan dike hedef. Li bendava Tişrîn û Qereqozaqê jî bi awayek eşkere rojnamevanên ku heqîqetê radigihînin kir hedef. Du hevalên me yên rojnamevan; Cîhan Bîlgîn û Nazim Deştan dema ku li pira Qereqozaqê êrişên dewleta Tirk yên şerê taybet vala derxistin hatin hedefgirtin. Her wiha bi dehan hevalên me yên rojnamevan û erebeyên wan jî hatin hedefgirtin. Ji ber ku hevalên me herdu Şehîd Cîhan û Nazim propagandeyên derew ên dewleta Tirk vala derdixistin, hatin armancgirtin. Piştî şehadeta herdu hevalan, carek din xwestin propagandayên derew bikin, bi dehan rojnamevan xwe feda kirin û derbasî bendava Tişrînê bûn û berxwedana şervanan belge kirin”.

**‘Şehadeta Nazim û Cîhan ji bo rojnamevanan bû cîhê cesaretê’**

Ela Şehadeta Rojnamevan Nazim Daştan û Cîhan Bîlgîn ji bo hemû rojnamevanan weke jêdera cesaret û wêrekiyê rave kir û got: “Gelek Rojnamevan îro li li bendava Tişrînê bi ruhê Nazim û Cîhanan, tevî topbaran dijwar a hovane ya dewleta Tirk, kêlî bi kêlî rastiya berxwedanê bi rayê giştî re par ve dikin. Wek rojnamevan belgekirina hovîtiya dewleta Tirk erka me ya sereke ye. Tevî ku dewleta Tirk li ser rûpelên malperên civakî gefan li hevalên me yên rojnamevan dixwe jî, bi dehan hevalên me dema ku berxwedana gel û êrişên wê yên hovane dişopanîn. Lew re jî yekser tên hedefgirtin. Ji bo ku çavê rastiyê bişkîne, dema ku rojnamevan tên hedefgirtin dengê gel jî diçe gelek rojnamevanan bi birînên xwe yên giran kêliyên ku komkujî li ser gel dihat kirin belge dikirin û ji cîhanê re radigihandin.

Ela di dawiyê de got: “Cîhan Bîlgîn û Nazim deştan ji bo rajnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûn mînaka berxwedanê. Em ê heta dawiyê bi pênûs û kameraya xwe bibin dengê heqîqetê û xwedî li mîrasa hevalên xwe yên şehîd derkevin”.



## Kurdê misliman û paşeroj

**Hafiz Ahmet Turhalli**

Bi têkçûna Esad re, kesên ji xwe re dibêjin em Misliman in û sunî ne, desthilatî bi dest xwe ve anîn. Demekî dirêj e bi navê ola Îslamê, li Rojhelata Navîn û cîhanê, bi navê şîîtî û sunîtî desthelat dest diguherin. Ne şîîyan û ne jî suniyan, miletên ku ew birêveberiya wan dikin, ne azadî û aramî, ne jî dadwerî û wekhevî pêk neanîn!

Tiştê ku mirov weke hişmendî bawerke û di jiyanê de pêşnexîne, wateya wî jî nîne.

Ger ev desthilata niha li Sûriyê ne bi destê xwe be jî, di proje û planê de bi destê dewletên weke Îngilîstan û hevalbendên wê be jî, xwe weke nûnerê Îslamê dibîne. Cîhan hemû dizane hişmendî û bîrdoziya kesên li ser dikê xuya dikin, bermayên DAIŞ`ê ne. Li gor hemû cîhanê vana terorîst bûn û li ser serê wan xelata milyonan pereyan hatibû danîn.

Deshilatên cîhanê dixwazin cîhanekî di berjewendiya wande were saz kirin. Lê rojane di çavê me misilmanan de, Îslam her diçe tê reş kirin. Weke kesên zarokan dikujin, destdirêjiya jinan dikin, mal û samanê milet didizin û kiryarên nelirê dikin, her tim berçav û zindî têne hiştin. Dixwazin ji me re bêjin dev ji vê olê berdin. Di avakirina piştî Baas, di Sûriyeya nû de wêneyekî gelekî xirab tê xuyakirin.

Bi navê şîîtiyê, weke Îran çiqas bû sedemên xirakirin û tevlîheviyan, dê rejîma Sûriyeya nû jî bi navê sunîtiyê berdewam bike. Di rêveberiya ku nû tê avakirin de, mirov dibîne ku kesên terorîst weke erkdar tên bicihkirin.

Xuyaye dewleta Tirk a çavkaniya fîtnê, ew ê vê polîtîkaya tunekirina Kurdan berdewam bike. Dijî vê fîtnê, divê Kurd bi giştî yek deng bin û ji bo mafên xwe yên netewî têkoşîna xwe her bilindtir bikin. Kurdên misliman jî karibin ji dîroka xwe û ya mislimanan dersê derxînin. Heta niha Îslama ku bi navê desthilatê kar kiriye, tu çareseriyek ji bo pirsgirêkên civakê pêk neaniye.

Ger Kurdê misilman di hişmendiyê de, derketinekî û îctîhadekî nû li gor ruhê demê peyda bikin, dê karibin gelek tiştan li Rojhilata Navîn jî zelaltir bikin. Divê milê Îslamê yê hişmendiya ku rawiştê, aşitiyê, wekheviyê û aramiyê weke pêdiviya bingehîn were dest girtin. Li ser dadmendî û zanebûnê, lêhûrbûn werin pêşxistin. Ev oldariya ku piştî wefata pêxember hatiye pêkanîn, oldarî, dagirkerî, şer û xenîmetiyê. Divê mislimanên Kurd ji ber ku, ev karesat herî zêde ser miletê wî de hatine, jê tecrûbeyan derxîne û van tecrûbeyan bi oldarên Îslamê re par ve bike. Tedbîrên lêşkerî tenê nikarin pêşiya vê felaketa ku bi navê mislimantiya me jiyan kiriye û em dijîn bigire.

Divê em ji Îslama desthelatê dûr bikevin. Îslama civakê û ya rawiştê pêş bigirin. Divê em zanibin kuştina mirovan bi navê ola Îslamê heram e û ji bo desthilatê kuştin fîtne ye. Divê weke mislimanên Kurd, em îctîhadekî ku bersiv dide van pirsgirêkan ava bikin. Em ola Îslamê li gor bingehên wê zelal û eşkere bikin. Em vê hişmendiyê di nava civaka xwe de biçînin û di nava mislimanên dunyayê de, cîbicîh bikin. Îslam di hişmendiyê de hatiye xirakirin, divê carekî din ev hişmendî were sererastkirin. Ev tişt zelal e; ger xweda jiyan afirandiye olekî dijî jiyanê naşîne. Muxatebê Qur’anê eql e, karê ku tê de hiş tune be, Îslam li wê derê tune ye.

Divê bi pêşengiya Rojavayê welatê me, Kurdên misliman hişmendiyekî zelal ji bo jiyanê ava bikin.



# Viyan Adar: QSD û YPJ’ê wê bi rihê Bavê Teyar dagirkeriyê têk bibin

Fermandara YPJ’ê Viyan Adar diyar kir ku gel û şervan mil bi mil şerê gelê şoreşgerî dimeşînin û wiha got: “Em ne tenê li hemberî artêşekê li ber xwe didin, di heman demê de li hemberî NATO’yê şer dikin”.

**Argêş Viyan/Qamişlo**

Derbarê berxwedana QSD û YPJ’ê û meşandina şerê gelê şoreşgerî û piştgiriya gel ya Bendava Tişrînê de, Fermandara YPJ’ê Viyan Adar pirsên rojnameya me bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:

**-Di destpêka êrîşên dagirkeriyê heya îro berxwedana şervanên QSD û YPJ’ê bê navber didome. Bi şêwazên pispor ên şervanan bi keda xweavakirinê, nexşerêyek çawa daye berxwedaniya Bendava Tişrînê?**

Şerê cîhanê yê 3’emîn ê ku li qada Rojhilata Navîn û bi taybetî jî li Sûriye didome, gelek hesabên hêzên hegemon serûbinê hev kir û ji bo ku her dewletek sûdê ji vê rewşê werbigre, danûsitandinên siyasî, dîplomasî u leşkerî yên bê navber dan destpêkirin. Ev şer û dagirkeriya dewleta Tirk ji 27’ê Mijdara 2024’an de bi hilweşîna rejîma Baas’ê re hat destpêkirin, herêm derbasî qonexek nû bû . Tê gotin ku bi êrîşên 27’ê Mijdarê yên di aliyên komên çete yên girêdayî dewleta Tirk a dagirker ve hatin kirin, Sûriye hat rizgarkirin. Lê di rastiyê de, ji bona ku tu cihekî yan jî kesekî rizgar bike pêwiste tu şer û têkoşîn bikî û bedelan bidî. Lê berovajî vê, têkbirina rejîma Baas’ê re tu şer û pevçunên dijwar li ti parazgehên Sûriyê neqewimîn, û carekê de HTŞ di nava çend rojan de giştî parêzgeh û tevî paytext Şam jî xiste bin serweriya xwe. Ya rast ti berxwedanî ji aliyê artêşa rejîma Baas’ê ve nehate kirin,



rejîma ku di dilê xwe de hêza parastina gelê Sûriyê ye hindirê çend demijmêran de tevahî baregehên leşkerî û saziyên hikûmetê radestî HTŞ’ê û çeteyên girêdayi dewleta Tirk a dagirker kirin. Di nava vê gengeşê de dewleta Tirk a dagirker û şefê faşîst Erdoganê ku Kurd jê re bûne kabûs weke her carê bi destê çeteyên xwe êrîş bir ser gelê me li Şehba, Heleb, Minbic û niha jî bi dijwarî êrîşî Qereqozaq û bendava Tişrînê dike. Ev nêzî 2 mehan e şer bi dijwarî didome. Lê cîhan giştî pêwiste wê hûrguliyê baş zanibe, li wir ne tenê komên çete hene, lê belê artêşa NATO’yê ya 2’emîn hemberî şervanên azadiyê şer dike. Niha piştî tekçûna rejîma Baas’ê şer li ti parêzgehên Sûriyê nîne. Niha tenê li bendava Tişrînê şer dijwar e û ev bendava ku em qala wê dikin bendaveke xizmetgûzariyê pêşkêşî gelên herêmê dike. Bendava Tişrînê bendava tevahî Sûriyê ye û di aliyê xizmetgûzariyê de, pêdiviyên gelên herêmê hemûyan pêk tîne. Gelên herêmê ji vê bendavê pêdiviyên av û kehrebê digirin û di heman demê de jî, parastina kerasetên xwezayî û erdnîgarî yê herêmê dike. Ev bendav bendava parastina Iraqê ye jî. QSD û YPJ’ê şerekî dijwar dimeşînin. Bi zanebûna felsefa Netewa Demokratîk û parastina pêkhateyên Sûriyê şev û rojên xwe kirine yek, ji bona parastina Bendava Tişrînê. Bi vîn û hişmendiyek bê hempa jinên tekoşer YPJ’ê di eniyên pêş ên bendava Tişrînê de şerekî dîrokî dimeşînin, tiştekî jê bitirsin nemaye ew xwedî ezmûnên leşkerî yên xort û pispor in.

**Bi çi şêwazî şervanên azadiya Kurdistanê li hemberî teknîka dewleta Tirk a dagirker, li ber xwe didin?**

Em weke hêzên parastinê yên herêmê, ji bona parastina gelê xwe û di çarçoveya şerê gel ê şoreşgerî de gelê xwe diparêzin, ne ji bo ku em ji şer hez dikin. Bi şêwaz û taktîkên bin erd û esmanî û sîng bi sîng ve şerê man û nemanê li bendavê dimeşînin. Dewleta Tirk a dagirker difikire ku mejiyê kesî naşuxle ji bo teknîkên nû pêşbixînin lê bi derfetên xwe yên kêm me gelek amûrên leşkerî yên nû afirandine û bi wan derfetên xwe em li bendava Tişrînê şerê artêşa duyemîn a NATO dikin. Her roj ji bejahî, esmanî û bi çekên giran û bi şerê tunelan em dîrokek nû dinvisîn û rola herî bingehîn jî yê gelê me yê hêja û berxwedêr e. Îro em kelecana şerê gel ê şoreşgerî yê pîroz li bendavê jiyan dikin gelekî weke gelê kurd û Kurdistanî gelên Bakur û Rojhilatê Suriyê mil bi mil bi wêrekiyek mezin sîngê xwe li ber hemû top û balefirên dewleta Tirk a dagirker vekirine û parastina bendava xwe dikin. Hemberî hemû astengiyan û teknîka dewleta Tirk a dagirker em çalakiyan pêk tînin û gelek kuştîyên dewleta Tirk a



dagirker û komên çete di destên me de ne. Em zarokên wê axê ne û ti caran jî axa xwe ji dagirkeran re pêşkeş nakin.

**-Dewleta Tirk a dagirker zagonên şer jî, weke her tim bin pê dike, hûn wek fermandar wan kiryaran çawa dinirxînin û peyama we ji bo berxwedana gel ê qadê çi ye?**

Em Dayîkên me yên qehreman û fedayî weke zarokên xwe di rûyê şefê faşîst Erdogan û artêşa wî de dibêjin em ji mirinê mezintir in. Em xwediyê kesayetên wiha weke bavê Teyar in. Ji mirinê natirse, tenê ji bo jiyana azad têkoşîn dikin. Em xwediyê hunermendên fedayî û welatparêz weke Bavê Teyar in. Bavê Teyar jiyana xwe weke hemû şehîdan di dilê me de birînek hişt û di jiyana xwe de jî kenek di rûyê me hemûyan de hişt. Lê hêrsa tolhildanê jî di dilê hemû Kurdistaniyan de bilindtir kir. Ji bo gelekî wisa em canê xwe jî feda bikin ne zêde ye. Bi kiryarên derveyî hiqûq û zagonan ên dewleta Tirk a dagirker a faşîst bi armanckirina sivîlan li Bendava Tişrînê hewl dide hişmendiya zilamsalarî ya hêza xwe nîşan bide, lê sed mixabin ji ber ku hemû cîhan agahdare ku êrîşkirina kesên bê çek sucekî şer e û bêhêzbûnê dide nîşandan, di heman demê de lawaziya herî mezin e. Ji bo vê jî banga me ji rêveberiya demkî ya Şamê re ev e ku ji Iraq re ji sazî û dezgehên ku mafê mirovan diparêzin re, banga me ji hêzên hevpeymanê ya ku me bi hev re DAÎŞ têk bir, û ji tevahî gelê Sûriyê re ku bibin xwedî helwesteke tund. Li beramberî kiryarên derzagonî yên dewleta Tirk a dagirke xwedî li Bendava Tişrînê derkevin. Em jî weke YPJ’ê careka din soza xwe nû dikin û dibêjin êm ê hemû hêz û ezmûnên xwe seferber bikin. Tenê armancekî me di vê jiyanê de heye, ew jî bi dirûşmeya jin jiyan azadî xwe biparêzin. Bi eşqa me ji jiyana azad re wê tolhildan mezin û bilind bibe. Li ser wê bingehê em soz didin şehîdên şoreşê û Rêber Apo ku em ê weke YPJ û QSD’ê bi ruhê bavê Teyaran li ber xwe bidin.

# ‘Niyeta Erdogan ya aştiyê tune ye’

**Navenda Nûçeyan**

**Nivîskar Abdullah Şikakî diyar kir ku dewleta Tirk behsa aştiyê dike, lê rojane bi balefirên şer Rojavayê Kurdistanê bombebaran dike û di zindanên wê de bi hezaran siyasetmedarên Kurd girtîne.**

Ev 25 salin Rêber Abdullah Ocalan ku di encama komployeke navdewletî de hate dîlgirtin û heta niha di girtîgeha Îmraliyê de ye, zêdetirî 4 salane jî sîstema îşkence û tecrîdê li ser hatiye ferzkirin, piştî rûxandina rêjîma Esed, Tirkiyê dixwest Bakur û Rojhlatê Sûriyê – Rojavayê Kurdistanê – dagir bike,



ji ber vê yekê jî ew û çeteyên xwe gelek êrişan pêk tînin. Lewma dema ku Erdogan dît ku ew nikare vê yekê pêk bîne, bi rêya DEMpartî banga diyalogên aştiyê li Bakurê Kurdistanê kir.

Di derbarê vê mijarê de Nivîskar Abdullah Şikakî ji rojnameya me re axivî.

Şikakî diyar kir ku rewş li Kurdistanê bi giştî û bi taybet Rojavayê Kurdistanê pir nazik e û wiha domand: “Geşdanên dawî ji bo me weke kurdan pir girîng in, divê bi hemû îmkanên xwe kar û xebat bikin her wiha yekrêziya kurdan mijara herî sereke ye”.

Nivîskar Abdullah Şikakî bal kişand ser rewşa Sûriyê û destnîşan kir ku berjewendiyên dewletên mezin li Sûriyê hene, lewma dixwazin par ve bikin û wiha got: “Ev 14 salin hîn jî aloziya Sûriyê ne gihiştiye çareseriyekê, lê di dema dawî de xuya dibe ku ber bi encamekê ve diçe. Piştî rûxandina rêjîma Esed û hatina HTŞ, ji bo kurdan divê ji her demê zêdetir nêzî yekîtiyê bibin, ji ber ku yekrêziya kurdan dibe ku bandorekê li tevahî Sûriyê jî bike”.

Nivîskar Abdullah Şikakî wiha dewam kir: “Dewleta Tirk da ku xwe ji zextên navdewletî rizgar bike, piştî çara salan ji îşkence û tecrîda girankirî, rêya hevdîtinên bi Rêber Abdulah Ocalan re vekir. Derfetdayîna van serdanan ji bo Rêber APO re hilbet sedemên wê hene, di dîtina min de sedema yekem ew e ku zexteke navdewletî li ser Tirkiyê heye, ya duyem jî hilbijrtinên Tirkiyê nêz dibin, her dema ku hilbijartin nêz dibin Tirkiyê derfeta hevdîtinên bi Rêber APO re vedike û pişt re dîsa van serdanan qut dike. Erdogan gelek hewildan kirin da ku qutbûyînekê navabera Rêber APO û PKK çêbike. Lê dîsa jî ser neket. Biryara çareseriyê Rêber APO ye”

Nivîskar Abdullah Şikakî herî dawî got: “Niyeta Erdogan a aştiyê tune ye weke ku bang dike, tenê gotinan dibêje, lê di ser rastiyê de berovajî wê dike. Tirkiyê behsa aştiyê dike û rojane balefirên şer li ser Rojavayê Kurdistanê digerîne, êrişan dike û xakên herêmê kontrol dike, her wiha bi hezaran siyasetmedarên Kurd di zindanên Tirkiyê de ne. Heta ji dest gelê me derkeve her dem wê gavên cidî ber bi aştiyê ve biavêje”.

# Newroz Uysal: Abdullah Ocalan ji bo çareseriya pêvajoyê xwedî hêz e

Parlementera DEM Partî û parêzera berê ya Abdullah Ocalan Newroz Uysal diyar kir ku geşedanên li Rojhilata Navîn û Tirkiyê diqewimin, Abdullah Ocalan ji nêz ve dişopîne. Herwiha Newroz tekez kir ku Rêber Apo ji bo pêvajoyê xwedî hêza çareserkirinê ye.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Derbarê Hevdîtina ku bi Rêber Abdullah Ocalan re ji aliyê Şandeya Îmraliyê ya DEM Partiyê ve, pêk hat, Parlementera DEM Partî û Parêzera berê ya Abdullah Ocalan Newroz Uysal bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Giringiya hevdîtina Şandeya DEM Partî bi Rêber Apo re û naveroka hevdîtinê çawa bû?**

Sedema çûyîna şandeya DEM Partî, mijarên ku bandor lê kirîn, sedemên wê yên navxweyiya Tirkiyê, Rojhilata Navîn û cîhanê tevahî, geşedanên dibe gelek nirxandin hatin kirin. Di 28'ê meha çûyî de şandeya DEM Partî bi Abdullah Ocalan re hevdîtin pêk anî, di vê hevdîtinê de Abdullah Ocalan ji bo raya giştî peyamekî ji 7 xalan parve kir, ji bilî vê peyamê li ser naveroka hevdîtinê daxuyanî, hevpeyvîn, reportac bi gelek Heyetan re pêkanî û bi raya giştî re parve kir. Dema ku em li naveroka vê hevdîtinê meyze dikin, tişta herî sereke li pêşiya me dibe asteng, geşedanên ku li Rojhilata Navîn û Tirkiyê diqewimin, Abdullah Ocalan ji nêz ve dişopîne û li ser ihtîmala di pêşerojê de tiştên ku bibin fikir, pêşinyar û çareseriyên wî hene. Herwiha li ser van pêşinyar û çareseriyan weke nexşereyek, ew e ku divê girîngiya yekîtiya gelê kurd û Tirk ji dîrokê heya îro were naskirin. Di heman demê de li gorî vê berpirsyariyê tevgerandin hebe, di demên bûrî de li ser van mijaran Abdullh Ocalan gelek caran vê xalê xêz dike. Di heman demê de li ser pêvajoya hevdîtinê encamjêgirtin zemîna herî girîng meclis dibîne û li vê meclisê dixwaza ku hemû derdorên partiyên siyasî tevlî hevdîtin û pêvajoyê bibin û bi awayekî erênî bikaribin insiyatîfê bigrin. Dîsa di nava vê naverokê de Abdullah Ocalan hêz, îrade û sekna xwe ya salên 93'an û heta niha bi awayekî şênber dide nîşandan ku dibêje "Ez amade me". Di hevdîtina di 23'ê Cotmehê ya ku Omer Ocalan parve kirî de Abdullah Ocalan hem tewrîk hem jî pratîk amadebûna xwe dîsa anî bîra me, di vê peyamê de veguherandina demokratîk mijarekî sereke ye. Herwiha paradîgmaya dewletê û guherandinên wê, weke paradîgmaya nû bi nav dike, dixwaze ku ji bo erênî pêş de here û serdema aştî, demokrasî û yekîtî bibîne. Abdullah Ocalan di nava xalên diyarkirî de, dide xuyakirin ku navxweyiya Tirkiyê, Rojhilata Navîn û cîhanê dişopîne û dixwaze ji bo van alozî û kirîzan rolekê bilîze, ji bo ku vê rolê bilîze jî, ji hêz û îrada xwe bi bawer e. Lê belê derfet û berpirsyariyên derdorê tîne bîra we, lewra ji bo ku ev pêk were jî, peyamên wî ji raya giştî re parvekirî ne.

**Encamên hevdîtina Şandeya DEM Partî bi partî û kesayetan re çawa tên nirxandin?**

Piştî hevdîtina ku bi Abdulla Ocalan re pêk hat, peyama Abdullah Ocalan hem jî naveroka ku di hevdîtinê de hat axaftin, ji partî û kesayetên cûda re hate parvekirin, ji serokê meclisa mezin em bigirin heya 6 partiyên ku li meclisê nûnertiyên wan hene. Herwiha weke tê zanîn jî DEM Partî weke partiyekê pêkhate, bi van pêkhate û kesayetiyan re hevdîtin çêbû. Dîsa li girtîgehê serokên HDP'ê yê berê Selehadîn Demirtaş û Fîgen Yuksekdag, di heman demê de berdevka Kongra Civaka Demokratîk Leyla Guven, hevdîtin pêk hat. Hevdîtinên ku bi partiyên siyasî re derbas bûn, li ser wê daxuyaniyek hate dayîn û weke ku di wê daxuyaniyê de jî derbas dibe, her partî sedem û nêzîkatiyên wan cûda jî be, lê partiyên ku hevdîtin pêre hatî kirin, ev pêvajo, çareserî û têkilî weke bi xêra her kesî xêra civakê bi nav kirine, yan jî nêzîkatiyek derxistine holê û ev cara yekem e, bi vî navî û rêbazî hevdîtinek hatiye pêkanîn. Ji xwe di nava van nîqaşan de, pirs, hesasiyet an jî gumanên wan tiştê ku wan pirsîn, tiştê ku şandeyê ji wan hêvî kirî û parve kirî, gelek mijar hatine nîqaşkirin û bi gelamperî dema ku em bêjin hêviyeke erênî yan jî deriyekî ku nehatî girtî û ihtîmala nîqaş û hevdîtinên berdewamî bê kirin de, daye şandeya me û civakê, ji ber ku ev helwesta weke ku xêr an jî weke ku ihtîmal hatiye binavkirin, ji bo siyaseta Tirkiyê û ihtîmala çareseriyê jî nû ye. Herwiha girîn e ji bo berdewamiya pêvajoyê yan jî encamgirtina pêvajoyê, ev têkilî hem li meclisê be jî, hem ji bo çareserî û danûstendinên siyasî wê berdewam bibe.

**Dewleta Tirk heta çi astê nêzî pêvajoya çareseriya li Rojhilata Navîn û Tirkiyê dibe?**

Ya rastî ev pêvajo, têkilî û hevdîtin tekez bi daxwaz, erêkirin û qebûlkirina dewleta Tirk pêk tê. Çiqasî bi gotinên Bexçelî dest pê kiribe û hevdîtina Omer Ocalan, hevdîtina şandeyê û niha jî cara duyem e ku Şande bi Abdullah Ocalan re hevdîtinê pêktîne û bi erêkirina dewletê ev pêvajo tevahî pêk tê û berdewam dibe. Rewşa ku nû derketî holê ji bo Rojhilata Navîn, Cîhan, Tirkiyê û pêşeroja gelê kurd û gelên azadîxwaz, diyar e ku dewlet li gorî rewş û geşedanên nû li rêyekê digere, lê riyeke ku azadî û demokrasî jê derkeve, hîna jî neketiye cihê xwe de, çima em vê yekê dibêjin? ji ber ku navê vê hevdîtin û pêvajoyê bi zimanekî tund û gefxwarî, dixwazin binavbikin û mijara demokrasiya mafê kurd bi mijareke din ve girê bidin. Di heman demê de li ser kurd û tirkan navê biratiyê bi nav dikin, lê li ser pêşeroja Sûriyê û Rojava, sekeneke ne siyasî, exlaqî, wijdanî û ne jî biratiyê, nadin nîşandin. Gava ku em dinêrin weke serokkomarê Tirkiyê gotî, nav lepikên gedîfe, kulmên hêsin, em ê nîşanî wan bikin, hîn jî ev kulmên hêsin li ser serê kurdan bidawî nebûne. Li Tişrînê bûye bombebaran û di encamê de, gelek mirovên hêja û gelê kurd şehîd ketin, li aliyekî din li Tirkiyê operasyonên siyasî pêk tên û qeyûm têne avêtin. Ev kulmên hêsin hîna jî li ser gelê kurd in, ne lepikên gedîfe û ne destên aştiyê nehatine dirêjkirin, ev nayê wê wateyê ku hêvî û nêzîkatiya vê pêvajoyê, qirêj e û nerast e. Nediyarî li ser çareserî û demokrasiyê, israrbûna dewletê hîna jî xwe nade xuyakirin, ji ber wê xeteriyên zêde û bilind di vê rewşê de heye. Lê li kêlekê hêviyên zêde û bilind jî hene, hem ji bo kurdan, Rojhilata Navîn û Tirkiyê ev pêvajo encamgirtina wê bandorê li gelek aliyan bike. Dibe ku bandoreke mezin li dîrokê bi xwe bike, ji ber ku ev gavek û destpêkirineke. Avêtina gavê û destpêkirinê kîjan riyê, wê xwe encam bigre û bighêje cihê xwe, ne diyare, yan wê derî bi hêvî, azadiya gelan û ihtîmala jiyaneke din veke, yan wê dîrok xwe dûbare bike û windahî û metirsiyên mezin derbikevin holê. Lewra nêzîkatiya dewleta Tirk ji bo ku astên kêm, derkeve astên jor û gav were avêtin, herwiha nêzîkatiyên rast û bawerî derkeve holê, hem ev hevdîtinên ku bi partiyên din re çêbûne, bandoreke mezin bike, wê li hemberî kulmên hêsin têkoşîn û berxwedana gelê me berdewam be. Çawa bi tu gavê gelê kurd bê elternatîf nebe, niha jî wê têkoşîn û berxwedana xwe dewam bike.

**Di hevdîtina duyemîn a ku ji aliyê şandeyê ve pêk hat 3 xal ji raya giştî re hatin parvekirin, ev xal girîngiya xwe çibûn?**

Cara 2'emîn şandeya DEM Partî hevîdtina xwe di 22'ê Çileyê de pêk anî, li ser vê hevdîtinê ji raya giştî re daxuyaniyeke kurt hate parvekirin û di vê daxuyaniyê de 3 xal derketin pêş. Ya yekê ew bû ku Abdullah Ocalan ji bo vê pêvajoyê domdar bike, amadekariyeke wî heye û piştî ev amadekarî bidawî bibe, wê ji raya giştî re parve bike. Ya 2'emîn komîte û şande di nava xebatan de ne, wê hevdîtinên xwe berdewam bike, li ser hevdîtinên ku piştî hevdîtina yekemîn li giravê çêbûyî, serlêdanên partiyên siyasî, ev encamên van serlêdanan jî, ji Abdullah Ocalan re parve kirine, li ser vê ew jî wê hevdîtinên xwe domdar bikin û wê daxuyaniyeke berfireh bidin. Dîsa di nav xala 3'emîn de diyar bû ku wê ev pêvajo ji bo her kesî jiyaneke azad bîne. Li ser van hêviyan silav ji bo her kesî rêkiriye, tişta ku tê xuyakirin, nexşerêyeke herdû alî lihevhatî û zelal ji raya giştî re nehatiye parvekirin, amadekarî û xebat berdewam in. Herwiha ji bo ku ev amadekarî û hevdîtin pêş bikevin hêviya hevrejiyankirin pêk were, wê kar, xebat û têkoşîn her berdewam bike.



## Kurd aştiyê dixwazin

**Mihemed Seydî**

Rewşa Sûriyê her ku diçe zêdetir bi girêk dibe û li holê tiştekî bi navê dewlet nemaye. Li aliyekî dewleta Tirk axa bakurê Sûriyê dagir kiriye, bi komên xwe hîne tevliheviya li herêmê kûrtir dike û êrişî bakur û rojhilat dike, li alilyê din Israîl di aliyê leşkerî de di nava axa Sûriyê de ye. Li Berava Welat mirovên ji pêkhateya Elewî di bin navê ku alîgirên rêjîma Esed in bi destê komên selefî û tunderew li kolanan tên kuştin. Li ser ekranên televizyonan û medya civakî jî tehrîkkirina kuştina Kurdan ji aliyê Erebên şofînîst, zilamên rêjîma Baas ên berê û yên niha, çeteyên kirêgirtî yên dewleta Tirk ve, dewam dike. Ev kes eşkere banga kuştina Kurdan dikin ku berê alîgiriya DAIŞ'ê kirin da kurdan ji nav bibin û niha jî kî li dijî Kurdan di tevgerê de ye, pesna wan didin. Her çiqasî êriş li ser Kurdan hatibin kirin, ev 12 salin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê roj bi roj projeya wan mezintir dibe û bû sîwana hemû pêkhateyan.
Her wiha slogana Rêveberiya xweser jî her ew bû ku divê diyaloga Sûrî - Sûrî pêk were da dawî li êş û azarên gelê Suriyê were, lê rêjîma Şamê seriyek kişand û dewleta Tirk bi riya komên navê wê kiribûn mixalifeta Suriyê dikşand û herdû alî jî pirsgiraka mezin a vî welatî bûn. Piştî ku rêjîma Baas hilweşiya, vê carê HTŞ ket şûna wê. Berê Îran serwer bû, niha dewleta Tirk dixwaze Şamê li gorî xwe bide meşandin.
Fermandarê QSD Mezlum Ebdî beriya demekê ji televizyona Alarabiya re gotibû ku Îran aliyek pirsgirêkê bû û nedihîşt çareserî hebe. Niha jî hemû alî rola dewleta Tirk a di xirabkirina Suriyê de tînin ziman. Êrişên li ser bendava Tişrînê mînaka vê xerabkirinê ne û heta niha Şamê jî helwestek li dijî kuştina xelkên Sûriyê nîşand neda. Heta niha di bin navê ku ew gurûp ne di bin serweriya wan de ne, dengê xwe dernexistin, lê piştî hemû li dora xwe kom kirin ew ê çi bibe? Ger êriş dewam bikin, wê demê helwesta HTŞ zelal dibe û eşkere dibe ku ew wê li gorî dewleta Tirk tevbigere û şer gur bibe. Hêzên QSD li hember êrişan xwedî amadekariye lê dixwaze aştî bi diyalogê pêk were. Kurd ne bê alternatîvin û têkiliyên wê yên diplomasî li gel hêzên Rojavayî û him jî yê Erebî xurtin. Li ser erdê hêza leşkerî heye û xwedî derfetên aboriye. Di warê rêvebirinê de buye xwedî tecrûbe û projeya wê heye. Ger Şam pêre li hev neke, dibe ku Durzî li Siwêdayê û Elewî jî li Beravê xwe li hêza QSD bigrin. Her wiha derbarê rewşa Kurdan de, Omer Ocalan eşkere kir ku di dema hevdîtina li gel Rêber Apo, Apo gotiye ku derfeta di destê Kurdan de xurte û ger dewleta Tirk bijarteya şer a li dijî kurdan de dewam bike, dibe ku vekşe Anadolê û di wir de dojehê bijî.
Ev mesajên Rêber Apo, pir zelal dikin ku yê dijberiya Kurdan bike, ew ê bi ser nekeve û dibe bihêle Kurd bijarteya serxwebûna erdîngariyê hilbijêrin.



# 'Ez ê li ser hîmên Ragihandina Azad xebatê bidomînim'

Rojnamevan Silêman Ehmed diyar kir ku dema wî dixwest ji Rojavayê Kurdistanê derbasî Başûrê Kurdistanê bibe, ew bi komployekê ji aliyê PDK'ê ve hat revandin û wiha got: "Ez ê li ser hîmên Ragihandina Azad kar û xebatên xwe bidomînim."

**Têkoşîn Amara/ Qamişlo**

Rojnamevan Silêman Ehmed ku piştî 454 rojan serbest hate berdan, li ser girtin û revandina xwe ji rojnameya me re axivî .

**Serpêhateya Rojnamevan Silêman Ehmed**

Rojnamevan silêman Ehmed di destpêkê de wiha xwe da nasîn: "Di vê pêvajoyê de dibe ku her kes behsa Silêman Ehmed dikir, lê bi awayekî şênber ku ez xwe bidim naskirin ew derfet nebû. Ez di sala 1998'an li Efrînê hatime dinyayê, bê guman dema tu behsa Sûriyê dikî sîstema rêjîma Baas tê bala mirov. Ez jî weke Kurdekî min xwe di nava vê sêstema faodal de dît û min dest bi xwendinê kir û heyanî gihîştim zanîngehê jî em her di nava wê pergalê de bûn. Belkî her kes dizane ji bo me Kurdan xwendina beşa ragihandin di nava sîstemê de gelekî zehmet bû û derfet nebûn, ji ber wê jî min beşeke din hilbijart. Bi destpêkirina şoreşa 19'ê Tîrmehê re, min jî weke ciwanekî Kurd cihê xwe di nava vê şoreşê de girt. Bi taybet di aliyê xebatê ragihandinê de nûbûn hebû û hinek zehmetî hebûn, min jî bi mereqa xwe xwest ez cihê xwe di nav de bigrim. Piştî em ketin nav de nû têgihîştin ku ragihandin çi ye, ragihandina azad çi ye, ragihandina desthilatdar û ya rêjîmê çi ye me nû naskir. Bê guman di şerê Efrînê, Helebê û Şehbayê de jî me xebatê ragihandinê da meşandin. Bi taybet di nava şoreşa weke şoreşa Rojavayê Kurdistanê de ku di hundir wê de gelek şoreş hebûn hatin destpêkirin, min dixwest ez rastiya vî gelî bigihînim raya giştî. Di destpêka tevlîbûna min ji ragihandinê re, min di Ajansa ANF`ê de kar kir, piştî wê derbasî Ajansa ANHA`yê bûm her wiha di ragihandina leşkerî de jî min cihê xwe girt. Piştî qonaxa Efrînê ez derbasî Ajansa Rojnews bûm û xwesteka min bû ku derbasî Başûrê Kurdistanê bibim û xebata xwe li wir bidim meşandin. Bê guman xebata min ne tenê di çarçoveya Ajansê de bû, weke rojnamegerekî di aliyê nivîs û tevlîbûnan de li ser paradîgmeya Rêber APO ez tevdigeriyam. Ji 2019'an heyanî 2023'ê min li wir kar dikir. Bi hîmên ragihandina azad bi awayekî aktîv min xebat meşand. Bi tayebt di navbera Başûr, Îraq û Sûriyê de roleke girîng a ragihandina azad hebû û derket pêş".

**`Girtina min plankirî bû`**

Silêman di berdewamiya axaftina xwe de wiha behsa pêvajoya girtina xwe ji aliyê hikûmeta Başûr ve kir: "Ev bûn çend sal in ez li Başûrê Kurdistanê jiyan dikim, li wir her hatin û çûyîna min a Rojavayê Kurdistanê çedibû. Di aliyê qanûnî de ti pirsgirêkên min nebûn. Lê ji ber koça dawî ya bavê min, min xwest ez werin Rojava, yanê hatina min ya Rojava ji bo merasîma Bavê min bû. Di wê demê de min xwest ku ez derbasî Bexdadê jî bibim û xebatekî bidim meşandin. Li ser daxwaza min ji ber min vîza jî pêşkêş kiribû û hate derketin û diviyabû ku ez vegeriyama. Di 25'ê meha 10'an 2023 de dema ez vegeriyam li ser sînor weke planekê hatibe amedekirin û ez hatim girtin.
Dema ez li korîdora Pêşxabûr bûm her hewil didan ku dem derbas bikin, piştî çend seatan nêzî saet 2 û nîv bû hêzeke awlekariyê ya PDK ê hat û ez lêpirsîn kirim. Pişt re bi plan ji min re gotin here êdî saet bibû 5 ê êvarê wesayîtên çûnûhatinê nîn bûn. Ji min re gotin ka em te bigihînin keraca Dihokê, wê demê de min zanî ku planek heye û min bawer nekir. Dema ez bi wan re hatim em derbasî çolekê bûn, her der tarî; bi rastî jî tirsek di hundir min de hate avakirin û êdî pirs di serê min de geriyan. Wê demê bi awayekî fermî gotin ku ez êdî hatim girtin û nêzîkatiya wan bi min re hate guhartin".

`Di beşa Terorê de hatim girtin`

Silêman bilêv kir ku ew di zîndana PDK ê di beşa terorê de hatibû binçavkirin û wiha got: "Bê ku agahiya min jê hebe ez ber bi ku ve diçim û wê çi bi serê min bikin, ez anîm cihekî. Dema em gihîştin wir û çavên min vekirin ronahiyeke gelek bi hêz hebû min nedikarî ku pêşiya xwe bibînim. Wê demê min zanî ku ev sîstema zîndanê ye û ez anîme zîndanê, di wir de bi awayekî bilez lêpirsîn kirin, kî me, girêdayî kê me, çi kar dikim û hwd. Pişt re ez derbasî odeyekî bûm nêzî 30 girtî tê de hebûn, min welatparêzek li wir nas kir ew jî ji 6 heyvan berê de hatibû girtin; wê demê wî ji min re behsa cihê ku ez anîme kir. Ew beş ji zîndanê beşa Terorîstan bû, gelek DAÎŞ li wir hebûn. Ji aliyê PDK ê ve weke meşandina şerê psîkolojîk, hêza ku li hember DAÎŞ şer kiriye û bi bin xistiye di heman cihê de digirtin gel hev. Li gorî wan ên girêdayî PYD û PKK ê di beşa terorê de li gel DAÎŞ ê digirtin".

**'Li gorî yasayên ragihandinê nêz nebûn'**

Silêman diyar kir ku li gorî qanûn û pîvanên rojnamevanan nêz wî nebûn û wiha domand: "Li hember min şerekî psîkolojîk gelek dijwar dan meşandin, di dosyaya min de hatibû nivîsandin ku min îtîraf kiriye ku ez ji bo karê sîxurtiyê hatime Dihokê. Min ji wan re got ger min îtîraf kirye wê demê cezayê min deh salan jî bidin min, lê min îtîraf nekiriye û ti îsbatên wan li hember min nebûn. Ger ez karê terorê dikim ez ê çima bi salan li vir bimînim û hemû tiştên min li gorî qanûnê ne, ez ê çima vîzza Bexdadê daxwaz bikim? Her çiqasî ez îşkence kirim û zext kirin, lê ji ber ez ne terorim, min ev îtîraf qet nekir. Hemû nêzîkatiyên wan li hember min ne li gorî yasayên ku ez rojnamegerim bûn, ti pîvanên parastina mafê rojnamevanan nedan min û bi tewanên derew nêz min bûn. Lê di wê demê de min zanî ku hemû qadên ragihandina azad wê bê deng nemînin".

**'Bi Şehadeta rêhevalên Gulistan, Hîro, Jiyan û Nazim bandor bûm'**

Silêman di berdewamiya axaftinê de behsa bûyerên herî zehmet ên ku rastî wî hatine kir û wiha got: "Bê guman gelek tiştên ku mirov diêşîne hene. Lê tişta ku herî zêde ez êşandima dema ku min agahiya şehadeta heval Gulistan û heval Hîro bihîst, çawa ku balefira dagirkeriya Tirkiyê ew hedef girtine. Ya din jî di van demên dawiyê de agahiya Şehadeta herdu hevalan; Jiyan û Nazim. Ku me bi hev re gelek xebat meşandin di aliyê jiyanê de em gelek bi hev re mabûn, ev herdu agahî êşekî mezin bûn. Dema min ev herdu agahî girtin ez derbasî zîndaneke din bibûm, ew zîndan jî ya kesên ku dizî kirine bû. Mirov wê çawa hestên xwe bi kesekî dizek re par ve bike? Ew ê çawa te fêm bike? Helbet zehmet bû ew êş bi min re man. Lê tişta xweşik bi min re çêbûye, dîtina hevalê min yê rojnamevan Qehreman Şikrî bû. car caran me hev di karîdoran de didît û suhbet dikir, lê ji ber em her du rojnamevanin em ji hev dur xistin".

**`Ez di wê baweriyê de bûm ku li pey min hêzek çiyayî heye`**

Rojanevan Silêma da zanîn ku dema ew hatiye girtin bawer bû ku li pişta wî hêzek heye û wiha got: "Min cara yekem nûçeya li ser xwe bihîst piştî mehek û 5 rojan bû li ser radyoya Dengê Goran bû. min nedizanî hevalekî min yekîtî bû ji xelkê Zaxo bû, got were ev kenal car caran tiştê baş parve dike. Cara yekem min di sernûçe de navê xwe bihîst û derbasî nûçe bûn, wê demê em gelek xêfxweş bûn lê me li xwe diyar nekir. Min ji hevalê xwe re got dêmek hêzek li pişta min heye û behsa min dikin. Bi rastî jî ez her di wê baweriyê de bûm ku li pişta min hêzeke çiyayî heye û wê ji bo dengê rojnamevanan her tiştî bikin".



**'Destûra hevdîtinê ne didan'**

Silêman destnîşan kir ku destûr ne didan ku bi parêzeran re hevdîtin pêk werin û wiha pê de çû: "Dema ez derbasî dadgehê bûm, parêzeran xwestin ku min bibînim û bi min re biaxivin, ruxmî ku qadî got ku herin pê re biaxivin. Lê hatin pêşiya min sekinîn û nehêştin ku hevdîtin bikin. Pişt re dadgehkirina min taloq bû dema ez derbasî wê dadgehê jî bûme careke din hewil dan ku min bibînin, lê mixabin dîsa jî destûr nedan. Piştî 7 heyvan cara yekem parêzeran ez dîtim ew jî bi şaşîtî hate pêk anîn, lê piştî wê jî dîsa rê nedan ku hevdîtinan bi min re pêk bînin. Heyanî dadgeha dawiyê tenê yek carî hevdîtin hate pêk anîn û ev biryar tenê li ser min hate ferizkirin".

**'Divê mafê rojnamevanan were parastin'**

Rojnamevan Silêman di dawiya axaftina xwe de tekez kir ku ew bi moralekî serkeftî pêvajo derbas kir û hêvî kir ku mafê rojnamevanan li Başûrê Kurdistanê were parastin û wiha got: "Bi rastî jî ruxmî hemû nêzîkatiyan û tewanên derew yên li min bar kirine jî, lê yek carî moralên min nehatin şikandin ji ber di hundir min de baweriyek hebû ku ev pêvajo wê derbas bibe.
Lê di dawiyê de ez bi hêvî me ku hikumeta Başûrê Kurdistanê yê bê ji ber wê hilbijartin jî pêk werin, li gorî yasayên rojnamevanan nêz girtiyên ragihandinê bibe. Mafê wan divê were parastin. Ji ber di Başûr de mixabin ti mafekî rojnamevan û girtiyên siyasî nîn e.
Ezê bi rêgezên ragihandina azad karê xwe bidomînim. Ev xet girêdayî partiyan an jî hêzên siyasî nîn e, girêdayî civakê ye û rêya rast nîşanî wê dide. Di vê oxirê de gelek hevalên me şehîd bûn.

**FENER**



## Ne itîfaq û lihevkirin be, aqûbeta Esed e

**Idrîs Henan**

Hikûmeta defakto ya li Şamê ji tek aliyekê ve bi serê xwe avabûye û li gorî ti mekanîzmên veguhezîna siyasyî û pîvanên demokrasiyê çênebûye. Li gorî rewatiyên gelêrî û şoregerî jî nîn e. Ji xwe peyva "Demokrasî" li civîna bi navê (Konferansa Serketinê) nehat gotin! Tişta derketiye piştgiriyê nade istiqrara welat û ne jî ewlehiya wî ya neteeweyî dixe gerantiyê, civakê û axa welat jî tûşî parçebûnê dike.
Ji aliyekî din ve tenê nûnertiya tek layanekî mezhebî, qewmî û yek fikrekî homojen dike. Ji ber vê jî; eger rewatiyeke navdewletî bigire û çêbûneke wisa beolojîk binepixe, wê dubarekirina tecrubeya partiya berê desthilatdar a Baas be, lê vê carê wê bi rûyekî selefî be. Bi vî awayî jî mirov nikare weke veguherîn û qaşo ku şoreş bi ser ketiye bide pênasekirin. Ji bona vê yekê jî hewcedarî bi hinek fikrên zelal û ecîndeyên niştimanî heye, ev jî bi beşdariya hemû pêkhateyên Sûriyê pêkan dibe.
Di heman civînê de, serokê HTŞ, Ebû Mihemed Colanî ku piştî hilweşîna rejîma Esad rêveberiya xwe li Sûriyê ava kiribû, xwe weke serokê Sûriyê ragihand. Di heman civînê de destûra bingehîn ya sala 2012'an, artêş, yekîneyên ewlehiyê û parlamantoya berê hatin betalkirin. Her wiha Colanî biryara ji nû ve avakirina parlamanto xesib kir ku qaşo dê li şûna parlamanto meclîsekî biçûk ji bo birêvebirina qonaxê ava bike. Di heman demê de di wê konferansê de partiya Baas, partiyên Eniya Niştimanî ya Pêşverû, HTŞ û qaşo hemû toga, kom, girûpê leşkerî û siyasî û yêb sivîl hatin helandin û tevlî saziyê dewletê dibin. Beriya vê gavê jî, çawa ku HTŞ desthilatdariya xwe di bin slogana (kî rizgar dike hikûm dike) de li Şam radigihîne, hemû endamên xwe yên biyanî (Ozbek, Şîşen, Efgan, Tirkmenistan, HWD bi fermî kirin hemwelatiyên Sûriyê û payeyên bilind jî bi ser milên wan dan. Angu ji bona vê rojê derdora xwe şidand û beriya serdana mîrê Qatarê bi rojekê xwe weke serokê dewleta Sûriyê îlan kir.
Civîn metirsî û gumanên mezin li ser pêşeroja Sûriyê çêdike ku dûrî çavdêriya navdewletî û sponseriya NY, Koalisyona Navneteweyî, nûner û çavdêrên rêxistnên sivîl û yên mafên mirovan, bi lez û bez hatiye lidarxistin. Baskekî wê civînê çeteyên Tirkiyê ne ku di halê hazir de êrişî herêmên Bakur û Rojhilatî Sûriyê dikin. Di encamê de, bê ku erkdarkirina platformeke demokrat ku nûnertiya gelên Sûriyê û pêkhateyên wê bike hebe, HTŞ desthilatdariya xwe radigihîne û bê ku ti rêzê ji pirrengiya welat re bigire, eznavendîbûna xwe ferz dike û dawa sîstemek homojen dike. Şopên zayendperestî û netewperestiya faşîzma Tirk li vê civînê diyarker in. Tirkiyê hewil dide bi vî awayî hemû çeteyên xwe û desthilatdariyê Şamê, li ber raya giştî rewa bike, dixwaze şerê li dijî vîna gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, dagirkeriya xwe ji axa Sûriyê re bi hinek peyman û itîfaqên nû meşrû bike. Lew re jî mercên heyî bi kar tîne ku rewşeke dişibe ya Lîbyayê li Sûriyê biafirîne û dagirkeriya xwe fireh û mayînde bike. Eger Şam ne şirîkê wan daxwazên Tirkiyê be, wê çaxê çi karê Tirkiyê li ser xaka Sûriyê heye û çima destûr daye wê ku bargehên xwe li welat zêde û firehtir dike? Rexê dîtir ê tabloyê jî xuya dike ku Tirkiyê û çeteyên wê, ji ber tevlîheviya balansa hêzê û ji bona ku statuya xwe biparêzin, li Sûriyê minawereya dawî dikin.
Xilasî ancax bi rêya itîfaq û lihevkirinê be. Her wiha pêwîste desthilata bi zorê ya li Şamê jî baş dersan ji aqûbeta Esad û Tirkiyê bigire û qatilên anîne Qesrê, li şûna ku payeyan bi wan bixe, darezîne û li gorî rêgezên demokrasî, wekhevî û edaletê Sûryeyeke nû ya pirreng bi keda hemû pêkhateyên wê yên etnîkî û olî ava bike. Ne wisa be paşeroj wê ji ya Esed xirabtir be.